

# ROJA NÛ

Kisîyariya Roja Nû; ji bona erdêa Sûriye û Libnanê; 15 liyên Sûrî; ji bona welatên din 2 liyên îngilîzî. Bihayê Hejmarekê: 15 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanê.

XWEDÎ Û GERINENDE : MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## KURDISTAN

-II-

### Xelk û rûniştiman

Li gora hejmartiyarên rastir xelkên Kurdistanê ev in :

Di Tirkiyayê de 4.000.000; di Ecemistanê de 3.500.000; di Iraqê de 1.100.000; di Suriyayê de 300.000 di Sovyetistanê de 160.000; bitevayî ji bona axa Kurdistanê neh milyon.

Pir cara hin eşîrên kurd ji Kurdistanê derketine û di welatê xerîbiyê de ji xwe re gund û şaristan ava kirine, di Enebolê de, û li zehf derên Ecemistanê bi sedan ve gund û şaristanê kurdî hene, lê gava me hejmarên kurdên axa Kurdistanê kirin me ew ne hesî bandine. Ji xwe di axa Bulûc û Efgana de jî, eşîrên Kurd zehf in.

### Nijad, Xwin û Zimanê Kurdan

Nijadê Kurd ji komê mîletên hindî-ewripayî ye; xwin û zimanê wan jê ne. Mîletên hindî-ewripayî ne, ko çiraxa xweşî û zanîne, azahî û serbestiyê vêxistine û pê dinya ronahî û kamiran bûye.

Zmanê kurdî zmanekî xwerû ye, zmanekî dewlemend, abengdar û gelek şîra e. Ji erdê Sovyetistan û Iraqê pê ve, di birên welatên Kurdan ên din de, xwendegah û dibistan tu nîne; nikarî bûn bête vekirin.

Pişta şerê mezin kurd bi keyret û zehabî xwe gelek pêş ve çûne. Bi sedan ve kitêbên kurdî hatine çap kirin û gelek kovar û rojnâme-yên kurdî hatine derêxistin.

Îro rojnâme û kovarên ko têne belav kirin ev in: Riya taze, Erivan, Sovyetistan; Nîştîman, Lencan, Iran; Gelawêj, Dengî. Kîfîyî-Laze Bexda, Jiyan, Sîleymaniye, Iraq; Hawar, Ronahî; Şam, Sûriye; Roja Nû, Stêr, Bêrût, Libnan.

Berî şerê mezin, ye 1914-1918 an xwendin û nivîsandin di nav xelkê de zehf belav ne bû bû, îro em bi çavine geş dibînin ko di gundên biçûk de ji xelk ji xwendina zmanê xwe hez dikin û kovar û rojnâme-yên kurdî dixwînin.

### Bawerî û Dînê Kurdan

Ji kurdên me ên mîrxas êzêdî û ji welatîyên me mesîhiyan pê ve, piraniya kurdan misilman in, û piraniya kurdên misilman sin-nî ne. Lê nik kurda bitevayî hêj rêç û rêzikên dinê nijadê kurd ê kevin, dinê zerdeştî têne dîtin. Ji xwe baweriya me ev e ko dinê êzêdîya ji kaniya Zendavesta û Zerdeştî ye.

Zerdeştî dizanin ko Xwedê yek e û ji wî pê ve tu Xuda nîne. Himê dinê zerdeştî ê exlaqî sîsê ne: qencyê bide eqlê xwe, qencyê bêje, qencyê bike. Ji av, agir, ronahî, rasti, mîrani, comerdî, qenci û paqijiyê hez bike; qedrê gotin û

welatê xwe, jin û zaroya bigire û bizane ko di dinyayê de rêyek heye ew jî riya rastiye ye.

Ev binyad û qeydeyên hefro jî di navkurdan de hejra ne û kurd qedrê wan digirin.

### Dirok û Tarix

Nivîsevanên Sumeriya şehdetyê dikin ko kurd du hezar sal berî Isa Pêxember. di welatê xwe Kurdistanê de rûniştin û her û her şerf çîranên xwe Babillî, Hitîlî, û Asûriya kirine yê ko dixwestin welatê Kurdistanê bixin bin lepê xwe; rast e ko Kurd carna ketine bindestê çîranên xwe, lê tu cara wextekî dirêj ne mane di bin sermiyanîya wan de.

Kurda arkariya Sîrûsî kirine û pê Nîniwe û Babilonyayê vegirtine. Kurda Hîrmizgan û îbadetgehên zerdeştî, hikmên Zendavestayê jî tada mîletên hov û kûvî parastine û bûne nobetdarên wan; şeş sed sal berî Isa Pêxember.

Gava fermandarê yewnanî Ksenefon bi şegmanên xwe ve di Kurdistanê re derbas bû, kurd ew gelek êgandine, ji her ko kurd tu cara qail ne dibûn ko şerevaniyê biyanî pê li erdê Kurdistanê bikin.

Di wextê Sasaniya de qedrê mîletê kurd gelek mezin bû û wan karine hejra pêk anîne.

Siltanê mezin Selahedîn, neyarê Rîşar bi dilê şer, kurd bû û piraniya eşîrên kurdan di bin sermiyanîya wî de bûbûn yek. Sedsala sêzdehî de kurd di pêşîya eskerên mongola ên xedar û xwinxwar de bi meranî çok dane erdê û ew jî tixwîbên Kurdistanê qewirandine.

Pişka diroka Kurdistanê a nûjen bi Siltan Selîm Yek destpê dike; yê ko piştî xelîfetiya xwe, dixwest nemî mîletên misilman bigihîne hev û bi navê misilmaniyê yekitiya wan pêk bîne.

Bi destê Idrîsê Bitlîsî, zanayekî kurd, Kurdistan bi dilê xwe ketî civana mîletên misilman yê ko di bin sermiyanîya Selîm I de, padişahê Osmanliya giha bûn hev.

Li gora lihevhatina mîletê Kurd û serîm I, dewleta Osmanî tekîlî kar û şixulên Kurdistanê na be, kurd di welatê xwe de aza û serbest dîmin; lê heke dewletên xerîb dirêji axa Osmanliya kirin, Kurd bi esker û peran tîn bawara xelîfê misilmana û padişahê Osmanliyan.

Kurd li ser wad û gotina xwe mane û ji bona mezinahiya dewleta Osmanî hezar hezar car û bi sed hezara hatine kuştin.

NÛ DELHÎ—Qiwetên Hevalbendan Meingwan standine, sed mîl bi nav erdê Burmayê de; 2000 kuştîyên japonî li erdê mane.

Herwekî radyoa Tokyoyê elam dide bombardimanên Hevalbendan Rabaul xistine perşaniyêke giran. Rabaul qerargeheke japonî ye û bi bombardimanên dawin di wê de şewatîne mezin çêbûne.

SAN—FRENKSKO—Di erdê çîna ê Bakurî de, nijdevanên çîna ên welatparêz zererine diyar digihin qiwetên japonî. Di axa şantûngê de nijdevanên çîna 1.425 caran dirêji leşkerên japonî kirine.

## Ber Bi Serfiraziyê Ve

GEZAYIR—Eniya talyanî de, şerîne xurt û xwindar destpê kirine. Bi lez an bi giranî, pêçveçûna qiwetên Hevalbendan di vî eniyê de dom dike. Bi ketina Kasinoyê deriyê, êrîşên nû di pêşîya yekîneyên Hevalbendan de vebûye.

LONDRE, Refên britanî û emirkanî ev çend roj in, hêj bêtir zor didin hêjagehên elemana yê peravên Ewripa Rovayî û rê û rêhe sinên ko ji axa elemana ber bi roavayî ve dirêj dibin.

MOSKÛ—Erdî tu şik nîne ko bedena Ordîyên elemanî ya bereva niyê di eniya Sovyetî de, hildiweşe. Qiwetên von Maşteynê ketine perşaniyê, şerpeze bûne û baz didin. Îro hezar roj in şerê urîs û elemana dom dike, eleman ji axa Ukranyayê jî hatine qewirandin, û hêla nîroyî de bêmeçal in, xwe biğûnda dikişînin û nikarin di peravên Dnestrê de jî, bikevin çeper û kozikan û ji xwe re xetêke be revaniyê deynin.

Dubno ketiye, yekîneyên Ordîya Sor ber bi roavayî ve dimeşin. Jmerinka jî hatiye star din, 36.000 kuştîyên elemanî li erdê mane 13.000 hêsir ketine destê Ordîya Sor.

Niho çar daran de, çar şerîne mezin çêdibin. Ber bi Dubno Lwow, Brodî ve; axa Polonyayê; Ta Dora Tarnopol Proskurov û Nintayê de dîsa axa polonyoyê de, ber bi Lwowê di peravên Dniestrê de ber bi Romanyayê ve, Di Bugê de, li erdê Dubno, Kovelê

WEŞINGTON—Qiwetên Hevalbendan ji du alîyan zor didin qiwetên japonî, li Pesîfikê û der axa Birmnyayê. Leşkerên Hevalbendan bi serdestî pê li erdê piştçêprên japona kirine û di peravên Birmanyayê de japon xistine begaviyê; û rîya wan birîne, qiwetên ko niho di erdê Mayuyê de ne bê hêvî û perîşan mane.

NÛ-DELHÎ—Bi awaktî resmî didin zanîn: duhî leşkerên Hevalbendan nevala Hukawîngê ji qiwetên japona paqij kirine. Di şerên vî nevalî de 4.000 şerevaniyên japonî hatine kuştin û 1.800 mîl çargûşê erd, ketiye destê qiwetên Hevalbendan.

WEŞINGTON—Qiwetên Hevalbendan di hêla giravên Emîraliyê de, hemî niqtêyan heja ji dijimîna paqij kirine.

## Danezana Hevalhendan

LONDRE—Qerargeha Hevalbendan a mezin li Italiyayê dide zanîn: Piştî bombardimanê hewayî a xurt leşkerên me bi arkariya tîngan, dirêji Kasinoyê kirine.

Di eniya Serpirê de piştî êrîşêke xurt qiwetên me du niqtêyên, navçeperan vegirtine û her çend jî dijimîna bi qesda standina wan her du cihan ber—êrîşîne xurt kirine, hatine paş ve zivirandin û şkenandin.

Di eniya Ordîya heşt û pêncan a bingehin de tevdana kewte û sedmêran dom kiriye.

LONDRE—Şevê çuyî ji 1000 fêtir bombeavêjen britanî ên giran bi ser axa elemana de girtine û 3.000 ton bombe berdane hêjagehan. 40 balafirên Hevalbendan venegeriyane warên xwe.

GEZAYIR—Qerargeha Hevalbendan a mezin li eniya Behra Spî dide zanîn: Di Kasinoyê de şerîne no dom dikin. Refên Hevalbendan xwe zehf teft dane û duhî bitenê, 1.100 cara bi hewa ketine. Di qadên din de tiştêkî girane çê ne buye.

GEZAYIR—Di roavayê Kasinoyê de, di perçê ko hêj dijmin lê ne, qirênine xurt çêdibin. Duhî eleman ji avahê geheke mezin hatine derêxistin û bi şûnda avêtin, her cend jî tangên wan dikirin tekîlî qiwetên Hevalbendan bin. Bi sedan ve eleman, yê ko di nav xirbe û kaviilan de belav bûbûn hatine girtin û hêr kirin.

LONDRE—Radyoa Helsinkiyê danezana belav kiriye û pê elam daye ko Hîkûmeta Fenlândî qertên Urîsa nikare qebûl bike.

STOKHOLM—Qiwetên rûsî 165 kilomêtiran bi nav erdê Polonyayê de, pêş ve çûne.

## Sih bezar ton bombe hatine avêtin

LONDRE—Refên britanî 1000 ton bombe avêtine hêjagehên bajarê elemanî Frenkfurt, xesarîne dijwar gihane karxane û febrîqeyên kîmya û mekîneyan.

Refên britanî di nav her deqîqakê de 50 ton bombe berdidan hêjagehan, çend neçirvanên elemanî dikirin rêbiriya refên britanî bikin. Topên bajarê ew ber—balafir bi xurî şixulîne, ji vî êrîşê jî hinên din 22 balafirên Hevalbendan venegeriyane warên xwe.

Di nav heft rojên dawîn de refên Hevalbendan 30.000 ton bombe berdane bajarên elemana.

BERN—Radyoa elemanî dide zanîn, ko refên rûsî ji nû ve li payetextê Fenlândiyayê Helsinkî xistine.

LONDRE—Emîraliya britanî dide zanîn: Hêta îro gelîcengkêtiyê me, bi serê xwe, 77 noqavên elemanî binav kirine

LONDRE—Bi awaktî resmî didin zanîn: Refên britanî ji bombeavêjen Muskîtosan binevketî, li hêjagehên axa Germanistana Navîn û Nîroyî xistine û ev bê ko xessar bigêhe wan.

# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet  
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE  
Directeur - Propriétaire. EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement  
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## KURDISTAN

— IV —

On peut distinguer, au Kurdistan, deux groupes principaux de population, les citadins et les ruraux (sédentaires ou nomades), le second étant, de loin, le plus important. La cité kurde a d'ailleurs, plus souvent l'aspect d'un gros bourg agricole que celui d'une ville. C'est un centre artisanal et un marché, où les paysans des environs viennent s'approvisionner et écouler le produit de leurs terres; le négoce y était autrefois presque entièrement entre les mains des chrétiens. Notons à ce propos que la plupart des grandes familles choisissaient de préférence des intendants ou des hommes d'affaires de cette confession. Ces agglomérations, qui jouent le rôle de capitales économiques sont, en même temps, les chefs-lieux politiques des cantons qui les entourent. A l'époque des émirats, elles servaient de résidence à des princes ou à des begs entourés de leur petite cour.

La population rurale se divise à son tour en deux catégories: les « ra'iyat », et les gens de tribu, « acura ». Les premiers, en minorité, sont de très anciens sédentaires, dans lesquels on a voulu voir les descendants d'autochtones soumis et assimilés par les conquérants kurdes. Cette thèse paraît vraisemblable, en ce qui concerne certaines régions, elle l'est moins dans d'autres cas. Les « ra'iyat » sont des cultivateurs paisibles, musulmans ou chrétiens, ils possèdent les terres qu'ils exploitent et ne sont astreints, vis à vis des tribus dont ils dépendent, à aucune obligation extraordinaire. Ils constituent toutefois une classe inférieure, qui évite de participer aux guerres, et dont les membres renoncent volontiers à la vendetta pour accepter le prix du sang.

La tribu est, au Kurdistan, le phénomène social le plus répandu. Les tribus, dont nous étudierons plus loin l'organisation, sont nomades, (Kotch) sédentaires, semi-sédentaires ou encore, mixtes. On peut noter, depuis la fin du XVIIe siècle, une évolution très nette vers la sédentarisation, due principalement aux efforts déployés par les autorités ottomanes. La fixation au sol des groupements les plus importants s'effectua au XIXe siècle. Le tracé des nouvelles frontières, après la dernière guerre, porta un coup décisif au nomadisme : les « kotcher » furent obligés de s'installer dans l'un ou l'autre des états créés par les traités, et par là, de réduire l'amplitude de leurs migrations. La situation économique défavorable qui en est résultée pour la majorité d'entre eux les amène peu à peu à renoncer

à vivre sous la tente, en pratiquant l'élevage. Chaque année, beaucoup se construisent des habitations stables, pour s'adonner désormais à l'agriculture. Les derniers clans de pasteurs se rencontrent actuellement en Syrie, et surtout en Iraq, encore la plupart sont-ils composés de semi-nomades, qui passent l'hiver dans les villages, où ils possèdent des terres, pour se répandre dans la steppe à la belle saison.

Les tribus kotcher avaient chacune, autrefois, une zone de parcours à peu près invariable. Elles hivernaient dans la plaine (Djeziré syrienne, région de Khanikine, en Iraq, etc.); dès les premières chaleurs, elles remontaient vers les « zozan » (pâturages d'été) des montagnes du Nord. Il leur arrivait de pousser ainsi jusqu'aux lacs de Van et d'Ourmia. Le cheptel comprenait surtout des chèvres et des moutons, les boeufs étant utilisés comme animaux de bât. Lorsque les nomades étaient plus puissants que les sédentaires chez qui ils campaient, ils les contraignaient à verser une « taxe de protection », dans le cas contraire, c'étaient eux qui devaient s'acquitter d'un droit de pâture, ils étaient même tenus de servir militairement l'agha du territoire sur lequel ils séjournèrent.

Les tribus sédentaires sont presque toutes d'anciennes tribus nomades, ayant changé de genre de vie, soit, comme nous l'avons vu, sous l'influence de pressions politiques, soit à la suite de revers de fortunes : qu'une épidémie ou qu'une saison mauvaise décimât le bétail, et l'on se trouvait dans l'impossibilité de repartir ; il fallait alors se fixer à l'endroit où l'on se trouvait, et commencer à cultiver le sol. Les exemples de groupements ainsi immobilisés sur leurs anciens pâturages d'été ou d'hiver sont très fréquents. C'est ainsi que les Barazis se sédentarisèrent, les uns aux environs de Malazgerd, les autres près d'Ourfa, et que l'on trouve souvent aux deux extrémités du Kurdistan, des tribus actuellement différentes bien que portant le même nom, mais qui, jadis, se trouvaient réunies. Ces épaves de la vie nomade sont connues sous le sobriquet de « gâvesti » ou « gâmeri » (boeufs fatigués ou boeufs-morts).

D'effectifs variables, le groupement n'a qu'une faible importance numérique (entre 50 et 200 familles) dans les régions où un relief tourmenté impose un compartimentage de la population poussé à l'extrême, comme au Botan ; dans les pays de plaine, elle atteint au

contraire des proportions énormes (plusieurs milliers de feux). Notons aussi que les groupements d'agriculteurs sont généralement plus considérables que ceux de pasteurs. En effet, le travail des champs réclame une main-d'œuvre abondante, tandis que les possibilités qu'offre l'élevage sont limitées par l'étendue même des terrains de pâture.

La tribu, sédentaire ou nomade, se divise en plusieurs fractions ou clans (bavek), dont chacun obéit à un chef semi-héréditaire.

L'autorité est exercée sur l'ensemble du groupement par le chef de l'un de ces clans, qui porte le titre d'agha. Il possède toutes les prérogatives d'un souverain, levant des taxes, rendant la justice, dirigeant les opérations guerrières. En contrepartie, sa charge lui impose de nombreuses obligations: il doit, en toutes circonstances, aider et protéger ses vassaux, intervenir en leur faveur auprès des autorités gouvernementales ; il lui faut enfin pratiquer la plus large hospitalité vis à vis des étrangers de passage. Un bon chef est récompensé de sa justice et de sa générosité par la fidélité à toute épreuve que lui vouent ses administrés.

Il importe de préciser que, dans les régions de très anciens sédentaires, et en particulier dans les provinces occidentales, les cadres tribaux tendent peu à peu à disparaître ; les anciens groupements, bien que subsistant toujours perdent chaque jour un peu de leur cohésion ; l'autorité traditionnelle des aghas est insensiblement remplacée par l'influence des grands propriétaires.

Nous avons vu plus haut que le Kurdistan était géographiquement compartimenté en cantons montagneux nettement délimités. Ces divisions naturelles se trouvent reproduites sans modifications par la carte politique du pays. En effet, chaque région forme un tout, qui se comportait jadis à la manière d'un petit état. Le chef en était généralement un émir qui, assisté de fonctionnaires choisis par lui — des chrétiens, souvent —, gouvernait par l'intermédiaire des aghas, ses vassaux. Il s'appuyait d'ordinaire sur une tribu qui lui était particulièrement dévouée, soit qu'il en fut originaire, soit qu'il eût su se l'attacher, et qui lui fournissait sa garde du corps et ses troupes. Les dernières principautés disparurent au XIXe siècle ; les Ottomans remplacèrent les anciens titulaires par une nouvelle aristocratie de grands propriétaires terriens, les begs. Ces parvenus ne disposant plus que de pouvoirs restreints, ne pouvant plus d'autre part compter sur la fidélité de leurs administrés durent s'entourer surtout de mercenaires, recrutés

en dehors du pays, et que l'on appelait « valets de fusil ». Dans d'autres régions, la ruine des émirats eut pour conséquence l'accroissement de la puissance des chefs religieux, dont certains réussirent à s'approprier une partie des prérogatives des anciens princes. D'ailleurs, on vit se former des confédérations de tribus ; la plus connue est celle des Millis, dont le chef, Ibrahim Pacha, joua un rôle important au début de ce siècle.

### HISTOIRE DU KURDISTAN

Les Kurdes firent leur apparition en Orient, sans doute, en même temps que les autres peuples iraniens — c'est à dire, vers le second Millénaire av. J.C. Les documents antiques ne nous apprennent pas grand-chose à leur sujet, tout au plus croit-on les reconnaître dans une inscription sumérienne datée de 2.000. Plus tard, au Ve siècle, leur présence est attestée dans les montagnes situées à l'Est du Tigre supérieur. Les historiens classiques parlent eux aussi, incidemment des Kurtioi ou Cyrtii, mais sans fournir de détails. Les Dix Mille se heurtèrent, pendant leur retraite vers la Mer Noire, à une résistance acharnée des Carduques, dans la région actuelle du Botan. Le récit que fait Xénophon de cet épisode est bien connu. Nous savons encore que les légions romaines d'Orient comportaient des corps irréguliers d'auxiliaires kurdes, recrutés dans la province de Corduène.

Il ressort de ces données fragmentaires que, jusqu'aux premiers siècles de notre ère, les Kurdes conservèrent jalousement leur indépendance, isolés dans leurs montagnes, se refusant à des contacts réguliers avec l'extérieur, et ne reconnaissant que par moment la suzeraineté des grands empires voisins, assyrien, perse, arménien ou romain. Ce fait explique l'ignorance dans laquelle nous laissent les sources, en ce qui les concerne.

Les chroniques byzantines sont également muettes sur leur compte de même que les très rares textes iraniens qui nous ont été conservés. Les actes des martyrs chrétiens, nous renseignent un peu mieux, tout au moins pour ce qui est de l'évangélisation du Kurdistan. Ce n'est pourtant qu'à partir du moment où les Kurdes sont touchés par l'Islam qu'ils entrent vraiment dans l'histoire, et qu'ils commencent à jouer un rôle important dans la politique orientale. Il semble en effet qu'après avoir opposé une résistance violente mais brève aux conquérants arabes, ils aient rapidement accepté, tout au moins en apparence, la nouvelle religion qui leur venait du désert. Cette conversion est à l'origine d'un mouvement de population d'une très grande importance

(voir la suite page 3)



pour l'histoire de l'Asie Mineure.

Tout fait croire qu'avant l'apparition de l'Islam, l'habitat des Kurdes était situé beaucoup plus à l'Est que de nos jours. La présence de puissantes confédérations kurdes dans le Fars est en effet attestée jusqu'au début du XIIe siècle : des théories récentes veulent même que la dynastie iranienne des Sassanides ait été originaire d'une des tribus qui les composaient. Par ailleurs, aucun document ne permet d'affirmer que ce peuple ait occupé avant le Moyen Age des régions situées à l'Ouest ou au Nord du Tigre. On est donc tenté d'admettre qu'un lent glissement vers l'Occident s'amorça dès les débuts du Califat, favorisé par la création de nombreuses colonies militaires sur les confins byzantins et qu'il se développa par la suite pour s'achever sous la poussée des hordes turques qui déferlèrent de l'Asie Centrale dès le XIe siècle. Ces migrations eurent pour résultat de transformer complètement l'aspect ethnique d'une grande partie du Proche Orient, les conquérants devant, par la suite, peu à peu assimiler les anciens autochtones. Cette expansion kurde se poursuit encore de nos jours, mais dans une autre direction, et sous l'influence d'autres facteurs : elle est orientée vers le Nord, et de nombreux documents portant des dates précises nous font suivre, depuis plus d'un siècle, la kurdisation de nombreux cantons arméniens, notamment dans les parages de Mouch, Van et Kara Killissé. Un exemple frappant est fourni par le canton de Bchéri, dont les habitants en majorité chrétiens de rite arménien ont oublié leur langue et leurs coutumes pour adopter celles de leurs voisins musulmans, et ne conserver que leur religion.

L'histoire du Kurdistan depuis l'islamisation de ce pays peut se diviser en plusieurs grandes périodes : les trois premiers siècles du califat, les premières dynasties kurdes, la domination turcomane et les invasions mongoles, l'ère féodale, sous les empires ottoman et séfévide, les premières tentatives d'unification du Kurdistan, l'époque contemporaine.

ooo

Tant que le pouvoir califal fut assez fort, les provinces kurdes, comme les autres parties de l'empire islamique, furent administrées directement par des gouverneurs nommés par le Prince des Croyants. Durant toute cette période, l'histoire du Kurdistan n'est faite que d'une longue suite de révoltes, dont l'énumération serait fastidieuse mais qui montrent bien l'opposition offerte d'un peuple épris de liberté à toute tentative de main mise étrangère sur son territoire.

ooo

Le pouvoir de Bagdad s'affaiblissant bientôt, ont vit apparaître dans les provinces les plus exotiques de l'empire des dynasties locales qui, d'abord vassales du souverain abbasside, se dégagèrent insensiblement de sa tutelle. Le Kurdistan ne fit pas exception à la règle. La première principauté importante qui s'y créa fut fondée

dans l'extrême Nord, à Nabil et Gandja, par le chef des tribus des Rawandi, Mohammad Chaddad, vers 951. Les descendants de ce personnage, les Chaddadides, acquerront Ani, ancienne capitale de l'Arménie ; ils se séparent bientôt en deux branches, celle d'Ani et celle de Gandja, qui subsistèrent, l'une et l'autre jusqu'à la fin du XIIe siècle. Princes très éclairés, ils laissèrent de remarquables souvenirs architecturaux.

A la même époque, en 959, Hassanwayh ben Hassan, chef des Barzikan, se rendit indépendant dans le Khouzistan. Soutenu par les Bouyides, il s'étendit encore vers le Nord. Il mourut en 979, laissant à son fils Badr des richesses considérables. Celui-ci ajouta la région de Kirmanchah aux domaines de son père, il régna jusqu'en 1014 et se fit remarquer par ses qualités d'administrateur. Malheureusement, lui disparu, les dissensions intestines ne tardèrent pas à causer la ruine et la chute de la dynastie naissante.

Elle fut remplacée par celle des Banou Annaz qui était originaire du Chahrezour, et qui, après avoir étendu ses possessions jusqu'à Dohok, recueillit la succession des Hasanwayhides. Elle connut également une fin prématurée : vers 1110, les envahisseurs seldjoukides achevèrent de dépouiller son dernier représentant.

La renommée des Chaddadides, des Hasanwayhides et des Banou Annaz le cède de loin à celle des Merwânides. Cette lignée eut pour auteur Abou Ali b. Merwan b. Dustak, neveu de Bâz. Ce Bâz, simple chef de bandes au début de sa carrière, s'empara plus tard d'Ardjich, d'Amide (Diyar Bekir) et de Mayafarîqin. Il marcha alors sur Bagdad, mais, repoussé par le bouyide Samsam, il dut battre en retraite et renoncer à son projet. Il périt dans un combat en 990. Son neveu, Ibn Merwân lui succéda. Les prince Merwânides florirent jusqu'en 1096 ; durant près d'un siècle, ils parvinrent à maintenir l'unité politique de la plus grande partie des territoires kurdes, malgré les tentatives répétées des Arabes des Byzantins et des Turcs. Leurs fiefs s'étendaient sur toutes les régions de Diyarbekir, Kbilat, Malazgerd et Ardjich ; ils englobèrent même, à moment donné, une partie de la Syrie. La puissance des Merwânides s'effondra sous les coups répétés des Seldjoukides. Ils laissèrent une réputation de souverains justes et éclairés ; grands bâtisseurs, c'est à eux que les villes des Diyarbakir et de Mezafarîqin doivent la plus grande partie de leurs trésors architecturaux. Il n'est pas sans intérêt de noter que ces princes, déçus de leur ancienne splendeur, subsistèrent en tant que chefs locaux jusqu'à nos jours dans le canton de Selivân.

Le XIIe siècle est marqué, au Kurdistan, par la disparition des principautés indigènes, au profit de nouveaux états fondés par des aventuriers turcomans. Les plus importantes de ces dynasties furent celles des Ortokides dans le Diyar Bekir, et celle des Zengides à Mossoul.

(à suivre)

ROBERT SURIED

# DEMA NIHA

MOSKU— yekmeyên Ordiya Sor ketine bajarê Nikolafêvê, di kûçê û kolanên vî şaristanî de şerîne no çêdibin. Ji aliye din Serfermandariya Sovyeta standina Kamenets - Podolski, elam dide.

Vîşî — Li gora radyoa Parisê wezîrê Bîlxaristanê ê dervekariyê gotiye ko hikûmeta bîlxarî xwe ji elemana veneqetîne.

LONDRE— Hefta borî heşt hezar bombeavê û nêçîrvanên Hevalbandan dirêji hêjagêhên axa elemana û yên vegirtî kir, we û nemaze bajarên Germanistanê ên mezin û têr destgeh û karxanên Berlin Frankfurt, Stuttgart, Hanover û Esen dane ber agirê xwe ê xurt û dijwar û bi sed hezaran bombeyên şewat û teqandinê avêtine hêjagêhên van şaristanan.


## MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN SER ÎO AŞTIVÊ

### CENG & BIHINGEH



Refêke xurt û mezîni ji bona êrîşêke dijwar xwe pêk tîne.



Çiyayekî agirî, mîna çiyayê me ê bilind û mîqedes Ararat; lê ev çiyayê he, hêj ne vemiriyê.



### SÈVOKA HECI

Sévoka Heci ecêbeke mezin diye, wîna li hingulîska xwe nêrî, ban cêriya xwe kir, go: Keçê îro kê li cem şivanê me ye? go: bi Xwedê kes li cem şivanê me tu niyê, bes yek f keçêl, yek f gurfî.

A dinê rojê, Sévoka Heci, satî, la şîr bi destê xwe girtiyê, berê xwe da bêriyê, çû bû li ber kalo sekiniyê, hey heram be, bi awira çava li kalo ne nêriyê...

Mîr mehîmûdê Cindî hat, pez anî bû, ser destê Sévoka Heci. Sévoka Heci gelek li Mîr Cindî fikiriyê; dikî, na kî aqilê wê na re ser ko ev Mîr Mehîmûdê Cindî ye.

Mîr Mehîmûdê Gindî hat, ji kalo re gotiye: ya kalo, Sévoka Heci qet li te na nêre, tu bi dere-wa dibêji, dilê min û Sévoka Heci tev heye. Mîr Mehîmûdê Cindî go: ya kalo, tu ê çî bidî min, ez bikim ko Sévoka Heci bi te re biştxilê?

Kalo go: ya xortê delal, tu çî bixwazî ezê bidime te.

Wê gavê, Mîr Cindî çû bû, li ber Sévoka Heci sekiniye; ev hûr ji serê xwe avêt, temberiya sor û sosinî ji bin hûrê kehir bider xistiye...

Wê gavê Sévoka Heci li Mîr Mehîmûdê dinêriye: hîn li nû de ev nas kiriyê. Hêdika destê xwe avêt ser stoyê Mîr Cindî ye, çû eniya wî maçkiriyê.

Sévoka Heci bi eşq û bi kêf, ber bi kalo de hatiye, heya Xwedê hiner daye, xeyzeranek li teniştê kalo xistiye; go: Kalo, xwe li wê der baveje êrdê, kurkê kalo li serê kalo wer kiriyê go: binêr, tu serê xwe ji bin kurkê derxîni, ezê sed xeyzeranê, li teniştê de bilêjmêrim.

Kalo, kurkê xwe, di xwe wer kiriyê; Mîr Cindî û Sévoka Heci ji xwe re dikin kêf û henek û axaftin e.

Kalo di guhikê kurkê re, ji xwe re li Mîr Cindî û Sévoka Heci dinêriye. Heyanî ewan ji xwe re kêf kirin ji nû de çû bûn kurkê ji ser kalo dan aliyê.

Gava ko Sévoka Heci bi rê ketiye, ban Mîr Mehîmûdê dikiriyê. Mîr Cindî li mehnê xwe siwar bû, bi teniştê Sévoka Heci re dimeşiya; ji xwe re, di rê de şewir û mişê, wir dataniye, gill û gazinê xwe pev kiriyê.

— ne qediyaye —

### STRANA KURDÎ

#### LÊ NEZANÊ!

Lêwîk digotî: lê, lê keçikê, keçika li ber avê; çiqa bejneke zirav; lê bayê xerîbî lê li bejnê serî silav diki li kokê ramîsanê, te qîzê îlyaqî vê bejnê; de heyla wey lê, lê li te nezanê...

Keçikê digotî: lo, lo lawiko, karwanîya karwan başî, law rê ye rê ye; bi min rê ye, îro du ro karwan tê re der û tê ye; ezê çiqa, bala xwe didimê, te ne çê, ne çê; kevira davêje gola avê ye, tê; ji mi re ne ke vê galgalê, vê gotinê yo, de heyla, wey lo, lo wer Xwedêyo...

Lêwîk digotî: lê, lê keçikê, çemê Palo bişewite lê wa bi bî ye, van bîya lêgirtiyê, tew li si ye, xwezî mi zaniba, bê esil û fêslê te ji kû ye; de heyla, wey lê, lê li te nezanê...

Keçikê digotî: lo, lo, lawiko, ez çîza mîrê Palo me, hezar û pênc sed siwar li piştê min e, ezê naka li kum kolosê bavê xwe bi gazî û bi qîrîn kim, ewê naka karwanê te li te bike, mîft û emel û belayê; de heyla, wey lo, lo wer Xwedê yo...

Lêwîk digotî: lê, lê, keçikê; ez Miê me, Miê Şemdin im, berdevkê Zor Temir Paşa me, hezar û pênc sed malê Şerqîyan, lê li pey min e, de heyla, wey lê; lê li te nezanê.

Keçikê digotî: lo, lo la wiko, erê wele, mi zani bû, t'ê ne ji welatê kumkolosê bavê mi bû, erê wele, mi zani bû, t'ê şemêrî ser bi xêlî, ez ni zanim ne tu bi neqîl ne, ne bi berdêlî, de heyla, wey lo, lo wer Xwedêyo...

Lêwîk digotî: lê lê keçikê heger bavê te dixwaze malê dinyayê bera olçêkekê bîne, ezê bidim çend olçêk zêrê osmanî ye, hege qayil na be, bîst û pênc kerî mîhê mi li pozê çiyayê Qerecaxê diçêre, bela here ji xwe re bîne, çend kerî mi ye, de heyla wey lê, lê nezanê...

Keçikê digotî: lo, lo, lawiko, karwanyo, karwan başî law rê ye rê ye, bi min rê ye; îro du ro, karwan te re der û tê ye; karwanê lawikê Yezîdxan meşîya, mêkewê

#### ISKANO

Lo, lo İskano, çepil dirêjo, navmil pehno!

Wextê şerê Helanê Zêwê, bû sind yayê

Ez bi Helanê zêwê ketim, wa li wê mill.

Ez çûm cem Bişarê Çeto, gawirê şefqekirî,

Ez çûm cem Emînê Xulam, gawirê şîretkirî,

Mi pîrs û suala İskanê xwe jê kirî,

Ji mi re digot: ciwabik nexeyrê dihat, û derbkê lê dane, li bejn û bala İskanê te rebenê,

Heyf û xebînetê, simbelê sor-hinekirî,

Di nav xwînê de dixemillî...

İskano, lo delal, pismamo lo delal,

Ez bi Helanê ketim, wa li wê mill,

Ciwabik nexeyrê ji mi' re dihatî û derbkê lê dane, li bejn û bala İskanê min, simbelê sor, di nav xwînê de diherbillî...

Ez bi Helana Zêwê ketim, bi Keleha Koçera, wa bi zinar e,

Ezê karê xwe bikim, berê xwe bidim, bajarê Diyarbekrê,

Ezê herim ser kaxez û erzuhala,

Laşê pismamê min, îro sê ro, ma ye nav neyara,

Ez bi Helana Zêwê, bi Keleka Koçera ketim, wa bi kevîr e,

Eskerê Boz Begî pîr giran e, mecalê

İskanê min, pê tune, sê nikare Hat cewabik nexeyrê, dibê pismamê te birîndar e, brîndarê xenceran e,

İskano qurban, mi şer divê û te şer navê;

Şerklî giran çêdibû, li Helana Zêwê, li Keleka Koçera, li wê navê Derbkê lîxistin, bejn û bala İskanê min,

Laşê İskanê min, ev sê roj in maye li ber tavê, li ber baranê.

da bû pê ye, de heyla, lo, lo wer Xwedêyo... Miê ban dikirî, gelf heval û hogir, an dilê min wayê, sê cara bi min wayê, hûnê ji dî me

—vegerînin— vê qedayê, vê belayê; de eyla, weylê; lê li te nezanê!....

Strancivîn: ŞÊXÊ EBDILQADIR

## PEJINÊN DINYAYÊ


Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdestî



Siwarên beriyê ber bi hindavên nû ve dimeşin



Di eniya talyanî de topên frensîzî dijîmina didin ber agirê xwe.



Eniya Talyanî : Waporên mezin tang û çek û posat anîne qiwetên Hevalbendan.

WEŞINGTON— Wezaretê amerîkanî a behrî dide zanîn: Bombe-avêjên amerîkanî Liberators, ji yekîneyên Ordiya qiwetên hewayî a Hefîan; dirêjî girava Wêkê kirine û ji hêla jêrin ve 50 ton bombe avêtine hêjagehên japonî. Ji aliyê din refên amerîkanî dirêjî Nawrûyê kirine û lîxistine, û di komgiravên Marşalê de ji sê qerargehên japonî dane ber bomban.